Kovara Metîn
Li Hêlên Sinûrî

Metîn

Kovara Metîn, ew kovara dinava cergê şoreşa Eylula mezin da yekem peyva azadîyê ji bona serfrazî û serkeftina doza kurdî ko bi xuh û xwîna Pêşmergey alayê Kurdistanê vehandî.

Evrokejî dîsan weku piştevanî bu veguhastina xebat û xuragirîya pêşmergên qareman li berokên şerî, tîmekê kovara Metîn seredana sengerên Pêşmergey kirin ko ne bitinê nivîser helgirê xameye bû û şandina peyvan, belko ew jî mîna birayê xo yê Pêşmerge di êk senger da hevalin û hev sozin jibona azadîya gel û welatî.

Çi carekê nivîserê peyamdar xu ji doza xo ya rewa ne veqetandîye, û herdem bi xameyê xu cwantirîn derbirîn ji êş û azar û xweşîyên milletê xu kirîne û bi kirîyar bi dehan qurbanî dayne.

Seredana nivîser û hunermend û rojinamenivîs û zanayên ayînî û tev texên dyên civakî bu sengerên Pêşmergey, xwe bixwe cwantirîn ramanên dilsozî û wefadarî û hev çeperîyê jibona beriz ragirtina xebat û xweragirîya Pêşmergey di gehînît û ramaneka cwan ji ferhenga wan derdikevît ew jî (em hemî Pêşmergeyne).

Li wî demî yê ko em ne digel xwîn riştinêne di çi awayekî da bît, lê eger şer li ser milletê me hate feriz kirin, hîngê em hemî xwe bi Pêşmerge dizanîn, û cwantirîn hêma ko mirov şanazîyê pê biketin her peyva (Pêşmergeye), lewra ji xudê mezin dixwazîn ko herdem Pêşmergên me di sax û silamet bin û ji her zîyanekê bi parêzêt û ev remezane li ser milletê me bi xêr û xweşî derbaz bît. û dîyare amajeyên peydabûna dewletbûna kurdî hêdî hêdî yê tîrojkên xwe ber didete hemî milletên aştîxwaz û milletê Kurd jî ji milletên aştîxwaze.